

## Dengê Rasana gelan nabihîzin

»»» R:2



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (317) 05-01-2018 Buha (1000) Tûmen*



**Mistefa Hicrî:**

## Wan meş û diruşm û daxwaziyên xelkê, hemû hêlên sor û bi nav pîroz ên rejîmê bezandine, û têk şikandine, û moraleke nû dane xelkê welat

»»» R:4

# Koka kedxwaran hejiya



**Roaja Pêncşemiyê 7`ê Befranbarê, li bajarê Meşhed û çend bajarên din, xelkê Îranê derheq giranî, gendelî, û talankirina serwet û samana welat ji aliyê berpirsên rejîma Îranê ve dest bi meşên nerazîbûnê kirin.**

Gellek nekêşa ku bera meşên nerazîbûnê ji hinek xwestekên aborî ve guherî bo daxwazên radîkal û pêkhateşikên ên wekî herifîna rejîmê û nemana deshilata serberedayî a Komara Îslamî, û berfirehiya wan meşên nerazîbûnê hemû aliyekî welat bi xwe ve girt.

»»» R:6

## 40 bergên pirtûka “Ramanên Dr. Qasimlo derbarê demokrasî ji bo Îrana çend netewe” li Rojhilata Kurdistanê de hatin çapkirin




**Endam û alîgirên PDKÎ, 40 bergên pirtûka “Endîşêhayê Qasimlo derbarêyê dêmokrasî berayê Îranê kesîrolmillê” (Ramanên Dr. Qasimlo derbarê demokrasî ji bo Îrana çend netewe) çap û belav kirin.**

Li gora nûçeya ku gihîştiye malpera “Kurdisatnmedia”yê, endam û alîgirên PDKÎ di çalakiyên xwe yên teblîxî de, vê carê karekî bê hempa kirin, û bona rêzgirtina ji yad û bîra vî rêberê leheng ê Kurd Dr. Qasimlo, 40 bergên pirtûka Endîşêhayê Qasimlo derbarêyê dêmokrasî berayê Îranê kesîrolmilê” (Ramanên Dr. Qasimlo derbarê demokrasî ji bo Îrana çend netewe) belav kirin.

Ew pirtûk ji aliyê endam û alîgirên PDKÎ ve, di navxwe ya welat de hatine çap û belavkirin, û ketine ber destên wan xwînerên ku dersxwanê hizr û rêbaza vî rêberê gernas in. Ew pirtûk ji aliyê Elî Munezemî ve hatiye nivîsandin, ku niha li welatê Norwêjê dijî, û ji aliyê Keyhan Yosifî ve bo ser zimanê Farsî hatiye wergerandinê ku herdu jî endamên PDKÎ ne.

## Sergotar

# Dengê Rasana gelan nabihîzin

N: Kerîm Perwîzî

Rejîma Îslamî a zal bi ser Îranê de, û rayedarên wê, bi sedema çewtekariyên bêqas û têketina di nava qofiya piropagendeyên dijîmirovî û derevîn de, dengê azadîxwaziya gelan nabihîzin.

Di roja 7`ê Befranbara 1396`an, di dawî rojên sala 2017`an Zayînî de, bizava mafxwaziya neteweyan û xelkên Îranê piştî çend civînên nerazîbûnê, wekî rûbareke boş, bendava astengiyên hemûreng ên rejîmê herifand, û lehiyeke sertaserî li Îranê de rê xist.

Lehiya vê carê, hatina ser kolanan ya xelkê hejar û kêmdahat û zulmlêkirî bû, ku tu hêviyeke wan ya geş bi vê rejîmê nîne, û qonax bi qonax îxanet li hêviyên wan hatiye kirin, û nanê ser sifreya wan hatiye dizîn, û ji bo mûşek û teqandina bombeyan û tevdanîkariyan di welatên derdorê de hatiye bikaranîn, û eva ku ji samana welat bo navxwe hatibe mezaxtin, bo berîka talançiyan bûye, û ciwanên vî welatî hatine bêkarkirin, û pêketiyê madeyên sirrker bûne.

Xelkê Îranê hêviyeke derevîn ji wan re hatibû çêkirin, û wisa didan xûyakirin ku piştî rêkkevtina Bercamê, jiyaneke xweş wê rû li xelkê bike, û heyî û serwet û samana derve wê berê xwe bide welat, û xelk di nava xweşiyan de wê bat bin! û gotibûne xelkê ku Spaha Pasdaran tenê li ber parastina cihên pîroz çûne Îraq û Sûriyê! û wisa nîşan dabûn ku ewê pêşiya hatina DAÎŞ`ê bigrin!.

Lê hemû ew derev û çewtekarî, di heyama du salên borî de, perde li ser wan hatin vêdedan, û wisa lê hat, ku bi milyardan Dolarî ji Sûriye, Yemen, Lubnan û Taliban, El-qaîde, û DAÎŞ`ê û…hwd re xerc kirin, û wisa lê hat ku xelkê Îranê bi hesret û xweziyan ve, çav li nan û hêkên nava fîlmên kevn bikin!.

Xelkê tûre û nerazî ji destê hemû gendelî û sivikatîpêkirinan ku rejîma

# Şer û pevçûn di navçeya Pîran ya ser bi Pîranşarê de rû da



Hêzên rejîma Îranê li navçeya Pîran êrîşî ser gundê Zêwe ya Pîran kirin, û çend mal wêran kirin.

Li gora nûçeya gihîştî “Kurdistanmedia”yê, hêzên rejîmê digel hêzên xwe yên kirêgirtî, roja Çarşemiyê 13`ê Befranbarê demjimêr 3`ê piştînîvro êrîş kirin ser gundê Zêweya Pîran, ya ser bi Pîranşarê, û bi awayekî hovane digel xelkê serederî kirin.

Di vê êrîşê de, “Pêşmergeyên Bajar” li hemberî hêzên rejîmê de dest vekirin, û bi êrîşeke berevajî (parastina rewa) derbeke bibandor li hêzên rejîmê û kirêgirtiyan dan.
Li gora zanyariyan, hêzên rejîma Îranê çend malên xelkê asayî bi tewahî wêran kirin, û di vê pevçûnê de, hejmareke berçav ji hêzên rejîmê hatin kuştin û birîndarkirin, ku li gora zanyariyên destpêkî, termê şeş kuştiyên hêzên rejîma Îranê bo nexweşxaneya Pîranşarê veguhastine.



Komara Îslamî wekî diyarî bo vî welatî aniye, ji mal derketin, û kolan ji destê dagîrker rizgar kirin. Caran rejîmê hemû kun û kunceke vî welatî bi poster û wêneyên rêberên dêwsifet ên xwe xemilandibûn, lê niha bixwe ketine lezê, û wan wêneyan jê dikin, da ku xelk wan wêneyan neşewitînin!.
Wekî hertim û wekî deb û resma hemû diktatoran, û wekî çar dehikên borî, rejîma Îranê bersiva nerazîbûnên xelkê bi serkut û tundûtîjî û girtin û kuştinê dide, û heya niha bi sedan kesî ji xelkê serhildayî di nava xwînê de hatine gewizandin, û bi dehan kesî hatine şehîdkirin.

Hemû berpirsên rejîma Îranê û hemû alî û hizb û girûp û baskên rejîmê pêkve be`ecîne, û hevdeng dibêjin ku eva pîlana dijminan e, dibe meşvan bêne serkutkirin û jinavbirin!.

Wisa xûya dike, ku li nêzî çar dehikan deshilata Îslamî li Tehranê, tenê karê wan zêdekirina dijmin bûye, ku heya niha dijmin gihîştiye ber deriyê rêberê rejîmê, û di nava Qum û Meşhedê de jî, neman bo Xamineyî û rejîma Îslamî tê gotin!.

Vê carê dengê xebatkarî û şoreşa xelkên Îranê û neteweyên blindest ew qas bilind e, ku guhê kerr ê Wilayeta Feqîhî bi hemû bandên wê ve nabihîze. Rejîma paşayetî herçend dereng, lê di dawiyê de got ku “min dengê şoreşa xelkê bihîst”, lê guhên vê rejîmê ew qas kerr in, û bixwe ew qas bawerî bi piropagendeyên çewt û derevîn ên xwe kiriye, û herwisa dengê şoreşa neteweyên Îranê jî ew qas bilind e ku nikare bi van guhên vî dengê bilind jî bibihîze. Kirsdanka dîrokê çavnihêriya vê rejîma serkutkar jî dike, lê hêvîdar im, ku Xamineyî bi mirin, yan jî bi revînê derbaz nebe, û bikeve ber destê dadgeha şoreşa gelan.

# PDKÎ û Komelê daxuyaniyeke hevbeş belav kirin




**PDKÎ û Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê di daxuyaniyeke hevbeş de, daxwaz ji civaka navdewletî kirin, ku piştgiriya xelkê Îranê bikin.**

**Deqa daxûyaniyê:**

Daxûyaniya hevbeş derheq meşa nerazîbûnê a xelkê Îranê

Xelkê azadîxwaz ê Îranê!
Neteweyên mafxwaz ên Îranê!
Kom û komeleyên navneteweyî!

Di çend rojên borî de pêleke mezin û berfireh ya meşên nerazîbûnê yên civatên bêzarbûyî ên xelkê Îranê dest pê kir, û heya niha jî berdewam dike.

Çavkaniya serekî ya van nerazîbûnan kirîza aborî û kêşeyên kelekebûyî ên aborî û siyasî di nava Îranê de ne, ku encama çendîn dehikan hikûmeta stemkarane û pirr ji kirîz a Komara Îslamî ye, ku weha kiriye ku li ber xirabiya rewşa aborî, û bêminetiya hikûmetê li hemberî rewşa jiyanderbazkirinê, û bedbextiyên xelkê desteng û hejar, û herwisa mezaxtina bi qasî milyardan ji samana vî welatî, di tevdanîkariyan, û kiryarên terorîstî ên rejîma Îranê li navçeya Rojhilata Navîn, xelkê Îranê bi hemû tex û çînên cur bi cur ve bêne ser kolanan, û daxwazên xwe û dijberiya xwe digel tewawiyeta rejîma Îslamiya hakim di Tehranê de nîşan bidin.

Ew meş, herwisa îşareyek e bi tûreyî û kîna serhevde kelekebûyî ya bi salan ji deshilatdariya kêrnehatî, gendel, nedadperwer û dîktator ku tu mecalekê bo nîşandana nerazîbûnan bi awayekî medenî nade hevwelatiyan, û di hember de berpirs nine, û tu hesabekê bo îradeya wan nake.

Di heman demê de, xwepêşandan nîşana vê rastiyê ne, ku xelk bêhêvî ne li hemberî sozên berdewam ên Rûhanî û diruşmên birewneq (birîqedar) ên reformxwazan, û êdî amade nînin, pişta xwe bi baskên deshilatê ve qahîm bikin.

Wan nerazîbûnan piraniya bajarên Îranê bi xwe ve girtiye, û diruşmên xwepîşanderan bi rohnî eşkere dike, ku xelkê Îranê û hemû netewe, bi hev re vê rejîmê naxwazin, û daxwazkarê hikûmeteke demokratîk in, ku bersivderê daxwazên wan be, û dadperwerî û wekhevî û parastina kerameta mirovî û neteweyî bo wan desteber bike.

Rejîma Komara Îslamî wekî hemû demên din, li hemberî daxwazên rewa û kiryarên medenî ên xelkê de, tu bersivek nine, ji bilî serkut û tundûtîjî û her di van çend rojan de jî, bi sedan kesî destbiser kirine, û hêza zor ya pasdar û dijîgeliyan û bi çek û cebilxaneyên curbicur ve şandiye hemû ciyan û bajarên Îranê, û bi zora çekê dixwaze ku xelkê serkut û bêdeng bike.

Xelkê kurdistanê ku xwe hertim pêşengê eşkerekirina nerazîbûnan li şêwazên xwenîşandanan û bilindkirina dengê mafxwaziyê û azadîxwaziyê bûne, piştevaniyê dikin ji daxwazên xelkê sertaserî Îranê, bona gihîştina bi dadperwerî û jiyana baş û pêşeroja demokratîk û wekhev.

Em wekî PDKÎ û Komelê daxwazê ji hemû kom û komeleyên mirovdost û navendên siyasî û biryarder ên cîhanê dikin, ku piştevanê daxwazên xelkê Îranê bin, û zextê bo rejîmê bînin ku hindî zûtir destbiserkiriyên van meşên nerazîbûnê, û hemû destbiserkiriyên din ji tevgerên cemawerî li Kurdistanê û ji neteweyên din azad bikin, û hevdem daxwaza azadkirina hemû girtiyên siyasî ji rejîma Îranê bikin.

**PDKÎ**
**Komeleya Şoreşger ya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê**
**09.10.1396**
**30.12.2017**


# Xwefiroşekî rejîmê, gihîşte sizaya kiryarên xwe

Yek ji xwefiroşên girêdayî rejîmê, di bajarê Mehabadê de, gihîşte sizaya kiryarên xwe.

Li gora nûçeya gihîştî malpera "Kurdistanmedia"yê, xwefiroşekî ser bi Sapaha Pasdaran, yê bi navê "Cemal Cehanaram" xelkê gundê "Guptepe" a girêdaiyî bajarê Mehabadê, kete ber êrîşa gulleyên kesên nenaskirî.

Li gora vê nûçeyê, ew xwefiroş, sê roj berî niha, dema ku ew ji yek ji talarên bajarê Mehabadê vedigeriya mala xwe, ji aliyê çend çekdarên nenaskirî ve teqe jê tê kirin, û bi dijwarî birîndar dibe, û bilez navbirî ji bo nexweşxaneya bajarê Urmiyê dişînin. Nûçegihanê "Kurdistanmedia"yê, di vê derbarê ragehandiye ku, rewşa wî xwefiroşê girêdaiyî rejîmê gellek xirab e, û niha li jêr çavdêriya pîzişkî de ye. Her di vê derbarê de, nûçegihanê"Kurdistanmedia"yê, ragehandiye ku, di dema êrîşkirina bo ser wî tawanbarî, keçeke navbirî ya bi navê "Lavîn" jî tê kuştin.
"Cemal Cehanaram" xeyrî xwefirotin û sîxorîkirin û piştkirin li neteweya xwe, di salên derbazbûyî de, weke xweşxizmetkirina ji bo rejîmê,û serwet û samanê, bibû yek ji wan kesên kirêgirtî, ku di hemû pîlanên Îtila`atê yên li dijî xebatkar û xelkên asayî de, beşdarî dikir. Di heyama çend salên derbazbûyî de û bitaybet piştî ragehandina xebata nû a Rojhilata Kurdistanê, a naskirî bi "Rasan"ê, hemwelatiyên bêzarbûyî yên Kurd di Rojhilata Kurdistan de, ji her derfetekê mifahê werdigirin, da ku tawanbarên wiha bigihîjin sizaya kiryarên nemirovî yên xwe.
Di heyama du salên derbazbûyî de, ciwanên nîştimanperwer û bihelwest yên Kurd li jêr navên "Bazên Zagrosê" çendîn çekdarên rejîmê siza dane, ku dest hebûne di cinayetên rejîmê yên li dijî gelê Kurd de.
Sha

# Dengê pêngavên rojên pakane hesabê tê



**N: Mistefa Hicrî**

Roja Pêncşemiyê 7`ê Befranbarê bi hezaran kesî ji xelkê bajarê Meşhedê di demjimêr 10`ê sibehiyê de, li hemberî şaredariya bajar de, ji bo eşkerekirina nerazîbûna li hemberî giraniyê kom bûn. Hevdem digel Meşhedê li bajarên Yezd, Kaşmer, Nîşabûr, Noşehr û çend bajarên din, xelkê li rêpîvan û civînên xwe de, derheq giraniya nirxa hewcehiyên rojane, û ji aliyekî din ve li hemberî bêkarî û bê dahatiya xwe digel kêşeyên cidî ên jiyana rojane berbirû bibûn, bêzariya xwe ji rejîmê eşkere kirin.

Ji vê rojê ve heya dema amadekirina vê mijarê (12.10.1396`an), meşa gelên Îranê li çendîn bajaran berdewam e, û ew meş û nerizayetî, doma van zincîre rêpîvanan in, ku li mehên destpêka îsal de, bi taybetî di van çend mehên dawiyê de, rojane li bajarên Îranê de bi rê ve çûbûn, û her carê daxwaz û xwestekên xwe anîne berbas, wekî daxwazkirina mûçeya derengketî a kedkaran, nerazîbûna li hemberî xwarina pereyê xelkê hejar, ku bi hêviya wergirtina sûd û behreya wê, ku li hinek ji bankan de danîbûn, bi hemû sermaye û behreya wê ve, ji aliyê hinek mohre û demûdezgehên deshilatdarên gendel ên rejîmê ve hatine talankirin.

Diruşmên xelkê nerazî hekî di destpêka îsal de, zêdetir derheq daxwaziyên berteng û biçûk ên aborî û wergirtina mûçeyê derengketî yan derheq cubrankirina zirar û ziyana van pereyên xwe bû, ku di bankan de danîbûn, hêdî -hêdî û bi taybetî li rêpîvênên Pêncşemî û Înê ên Meşhed û Qum û Kirmaşanê de, tewaw reng û bêhna

**Di heyama nêzîk bi çil salan temenê Komara Îslamî de, xelkê Îranê roj bi rojê zêdetir ketin bin zexta emniyetî, aborî, kulturî, û …hwd de**

siyasî û dijî rejîmê bi xwe ve girt.

Mînaka van diruşmên ku xelkê di van meşan de didan, pêk tên ji:

“Dev ji Sûriyê berde, fikrekê bi halê me bike”, “Merg yan azadî”, “Girtiyê siyasî dibe were azadkirin”, “Xelk xwazokiyê dike, axûnd Xudayiyê dike”, “Netirsin, netrisin, em hemû pêkve ne”, “Ne Xeze, Ne Lubnan, canê min gorî Îranê”, “Mirin bo dîktator”, “Min çi şaşiyek kir, ku şoreş kir”, “mirin bo Hizbullahê”, “Em Komara Îslamî naxwazin”, û…hwd.

Berfirehiya xwepîşandanan û bi tayetî naveroka dijîrejîmêbûna diruşman, di hemû temenê vê rejîmê de, bê mînak e, lewra hekî di heyama yek meha borî de çendîn erdhej Tehran û bajarên din ên Îranê hejand, û mixabin li Kirmaşanê karesat afirand, û ew meş jî bo Komara Îslamî wekî erdhejê bûn, ku di rastî de, textê deshilata rejîmê livlivand, û wisa diyare ku wan jî lerizîna deshilat xwe hest pê kirine, û her yek ji wan bi awayekî ew hesta xwe nîşan dane.

Çend mînak ji nîgeranî û tirsa berpirsên rejîmê ji vê liv û tevgera xelkê Îranê pêk tên ji:

-”Di van rojên dawiyê de, pêvajoya eşkerekirina nerazîbûnan li hinek ji bajaran cî girtiye, ku diruşmên wan bêhna “fitnê” lê dike. (1)

-Guhnedana hinek ji demûdezgehên dewletî bi daxwaziyên bijîwa xelkê, kar gihande derbirîna nerazîbûna li ser kolanan, herçend li van meşan de, xelk destpêker in, lê yê ku dawiyê pê tîne merc nine ku xelk bin”. (2)

**Sedema tûreyiya xelkê çi ye**

Di heyama nêzîk bi çil salan temenê Komara Îslamî de, xelkê Îranê roj bi rojê zêdetir ketin bin zexta emniyetî, aborî, kulturî, û …hwd de.

Di vî heyamî de, ew xelk bi sedema baweriyên xwe ên ayînî, bandora şanogeriyên cadûyî ên axûndên kirêgirtî ên rejîmê, û tundûtîjî û serkuta bêrehmena ya neraziyan, û çend hokarên din, piraniya xelkê hekî carna gazindeyek jî dikirin, lê amade nebûn ku bi hatina ser şeqaman canê xwe bixin metirsiyê de, bi taybetî di vî heyamî de ku taqma bi nav reformxwaz bi çaverêkirina xelkê derheq egera guherîna li rejîmê de, dewreke nerênî ya gellek xirap lîstin, û xelk di vê çavnihêriyê de ragirtin.

Heta di dawiyê de, wêraniya welat, bedbextiya xelkê, û nebûna nan, û azadiya wan ji aliyekî, û têçûya bêsînor bo girûpên terorîst û deshilatxwaziya seranên rejîmê li derveyî welat, û têketina li çendîn şerên pirrxerc ku dehan milyard Dolar samana welat jêre bi heder dane, gendelî û talana dahata welat, ji aliyê berpirsên hûr û gir ên vê rejîmê, û eşkerekirina dizî û talanên yektir bo xelkê rohn bûye, ku vê rejîm çi malwêraniyek pêk aniye, û çawa ew malwêranî rojbirojê kûrtir dibe.

Ezê îşarê bi çend mînakên gellek biçûk ji xwedîderketina berpirsên rejîmê derheq destpîsiyên xwe ên malî, û ew malwêraniyên ku bi ser xelkê Îranê de anîne, bikin:

- Hucetul Îslam Mihemed Ce`iferiyê Muntezirî serdozgerê giştî di civîna pisporiya polîsê xebata li dijî qaçaxkirina kelûpelan û pere dibêje:

“Dema ku hinek ji berpirsan û kesên ku dibe bi dilsozî ve li qada xebata li dijî qaçaxê çalak bin, bixwe yan zarokên wan, yan kesên ku pêwendiya wan bi ewan kesan ve heye, bi awayekî di karê qaçax de beşdar bin, çawan tê kirin ku em çaverê bin ku xebata li dijî qaçaxçîtiyê bigîje encamê? “.

Navbirî her di vê civînê, û di beşeke din ya axavtina xwe de dibêje:

“Raportek ji yek ji parêzgehan gihaye wan, ku 1128 kantener kelûpelên qaçax hatine dîtin, ew 1128 kantener meger derziyek e ku tu bixî nava paketa şixarteyê (kibrîtê) de…”(3)

-Malpera fermî ya meclisa Şêvra Îslamî ji zimanê xanima Perwane Selehşûr dibêje:

-”Li gora amarên herî taze Îranê pileya yekem heye di tundûtîjiya civakî di 142 welatên cîhanê de, û ew rapor di domê de dibêje: “Ji Befranbara sala 1395`an ve, Rêkxirawa Pizîşkê Yasayî ên Îranê ragehand ku di heyama heşt mehên detspêka vê salê ve, zêdetir ji 400 hezar birîndarên pevçûnên di navbera xelkê de gihandine navendên pizîşkê yasayî”.

-”Îranê pileya yekem di xweşewitandina jinan di asta Rojhi-

lata Navîn de heye".(4)

"Xwekuştin di Îranê de, bi awayekî cihê matmayîbûnê dom heye, û faylên destbirina bo xwekuştinê di heyama pênc salan de, di sala 1390 heya sala1394`an di nava jinana de %66 û di nava mêran de %71 zêde kiriye"(5)

-Li gora lêkolîna taze ya Wezareta Tendurustiya Îranê ku encama wê li 19`ê Xakelêweya îsal de hatiye belavkirin, nêzî %24 ji xelkê Îranê tûşî nexweşiyên derûnî ne.

Ew yek tenê çend mînak in ji rewşa nebaş ya xelkê Îranê ku berhema rejîma Komara Îslamî û wan e, bedbextî û bêçaretiyek ku rojbirojê zêdetir ser hevde dibe kelek, û rejîm ne dixwaze, û ne jî şiyana çaresekirina van hemû kêşeyan heye.

Di demek weha de ye, ku xelk baweriya wan bi rejîmê namîne, û hêvîbirayî dibe, derheq çareserkirina kêşeyên bêsînor ên xwe, û dest dide serhildanê û derbirîna nerazîbûnan li dijî vê rejîma ku bedela jiyaneke baş û serdemiyane, cehnemek bo wan pêk aniye.

Serhildanek ku me li encama rapora siyasî ku pêşkêşî 17.mîn pilînoma Komîteya Navendî kir, weha pêşbînî hatiye kirin:

"Dûredîmenê pêşeroja Îranê, Îraneke şikestxwarî li derve, di biyavê aborî û siyasî de piştguhxistî, di navxwe de berbirû digel kêşe û netebahî û nerizayetiyên kelekebûyî, ku roj bi rojê zêdetir dibe" (6).

Ew meş û diruşm û daxwaziyên xelkê, hemû hêlên sor û bi nav pîroz ên rejîmê bezandiye, û têk şikanidye, û moraleke nû daye xelkê, û Komara Îslamî li hemberî çend riyên dijwar de daniye, ku biryardan di her warekî de, têçûyeke zaf jê re heye:

Yekem- Rejîm ku bi sala ye bi navê şandina derve ya şoreşa Îslamî kêşe û alozî di çendîn welatên Misilman, wekî Lubnan, Îraq, Yemen, Felestîn û …hwd saz kiriye, yan xwe tê xêstiye, û dahat û saman welat, heta nanê ser sifreya hejarên Îranî jî li vê riyê de xerc kiriye, û bi diruşmên xapandinane ên wekî jinavbirina Îsraîlê û dijberiya digel Amerîka û welatên Erebî ên Misilman xwastiye ku xwe bi berçav piştevanê Îslam a Şî`eya Wilayet Feqîhî di cîhanê de nîşan bide, nikare dev jê berde, û ji niha şûnda siyaseteke maqûlane di pêxema razîkirina xelkê xwe de bigre pêş, û ji vê zêdetir siyaset û diruşmên bêçine li dijî Îsraîl û Amerîkayê û …hwd nede, û koxatiya Misilmanan neke.



Hekî vê riyê hilbijêre, li hember vê pirsyara xelkê Îranê tu bersiveke hejî û pesendkirî nine, ku van hemû salan di vî şer û berberekaniya bê encam de, xortê xelkê daye kuştin, û welat wêran û xelk birçî kiriye, û hekî ew siyaseta seqet ya derekî jî her wa bidomîne, çawan dikare xelkê bêzarbûyî ê xwe razî bike, û kîna wan vemirîne?

Duyem- Di hemberî rêpîvan û nerizayetiya xelkê çi dijkiryarekê ji xwe nîşan dide? Hekî bê û riya tundûtîjiyê û serkutkirinê li dijî xelkê hilbijêre, riyek ku heya niha tenê vebijêrka rejîmê bû, bo bersiva nerazîbûnên xelkê, bêguman xelkê tûretir û kîndartir dike, û domandina vê riyê bo hertim, ezmûna hikûmetên dîktator ên din jî digel şikesta dîktatoran berbirû kiriye.

Xwe hekî bixwaze digel xelkê ser şeqamê jî riya lihevkirinê bigre ber, û bi nermî reftarê digel wan bike, ew xelk ji bilî herifandina text û bextê vê rejîmê bi tu tiştekî din razî nabe, ji ber ku tu baweriyek di navbera xelkê û rejîmê de nemaye, û rejîm

## Wan meş û diruşm û daxwaziyên xelkê, hemû hêlên sor û bi nav pîroz ên rejîmê bezandine, û têk şikandine, û moraleke nû dane xelkê welat

xelkê wekî bihêztirîn dijminê xwe dizane, û dijminane digel de reftarê dike, û xelk jî piştî nêzî çi salan bihîstina derev û nanbirînkirinê, hêviya wan bi reforman nemaye, û vê rejîmê bi heq, wekî dagîkerê azadî û jiyana xwe dizanin, û rizgariya xwe di nemana vê rejîmê de dibînin, lewra xelkê destên xwe kirine qirka vê rejîma dagîrker de, û heya ku nefes lê nebire, dest jê nakişînin, û vê yekê jî zû û derengiya wê heye, lê tu qise di vê yekê de nine.

Ew dereng û zûya jî, girêdayî ye, bi vê ku raperîn û rêberatiyeke hûrbîn, lêhatî, û bibawer serî hilde, ku bikare bibawer ve şeqamê berev rûxandina rejîmê biherikîne, û ji aliyekî din ve, bi bersivdana bi xwestek û daxwaziyên tex û çînên cuda, bi taybetî neteweyên belengaz ên Îranê yekgirtîbûna hemû xelkê vî welatî bo rûxandina rejîma Îranê, û bingehdanîna hikûmeteke demokratîk û îroyîn desteber bike. Ne rêberatiyek ku wekî rêberên tevgera Kesk ku rêberatiya Wilayeta Feqîh û yasaya bingehîn û lahêzên (ehromên) din ên rejîmê qebûl dikirin, û tenê nerizayetiya wan, ji destê dizîna van dengan bû, (bi gotina wan), ku rejîmê bi qazancê Ehmedînijad destêwerdan tê de kiribûn, lewra xelk bi giştî tê de beşdar nebûn, û bilez hatin serkutkirin, bûyerek ku li rêpîvanên vê carê de, (heya niha) ne tenê her diruşmeke wisa bo piştevaniya vê bûyerê, û rêberên destbiserkirî ên wê nehatiye dan, belkû berevajî diruşmên "reformxwaz, tundrev, êdî çîroka we dawî pê hat", li piraniya rêpîvanan de dihatin dubarekirin, ku ew yek tê wateya dengê pêngavên nêzîkbûna pakane hisaba xelkê digel hikûmetê.

Jêrnûs:
(1)Husên Şerî`etmedarî berpirsê rojnameya "Kêyhan" a ser bi hikûmetê.
(2)Ehmed Tewekolî, nûnerê pêşîn ê meclisê
(3)Navenda nûçegihaniya Fars 27.09.1396
(4)Belavoka "Cîhana Sen`et" 14.03.1394
(5)(Xeber online) belavoka hikûmetî, 18`ê Xezelwerê
(6) "Komara Îslamî ber bi dakişanê
http://sikirter.org/Detail.aspx?id=10026&LinkID=10)

# Komîsyona Teşkîlatê ya PDKÎ daxuyaniyek weşand

**Komîsyona Teşkîlatê ya PDKÎ derheq meşên nerazîbûnê ên Îranê daxuyaniyek belav kir, û çend daxwaz ji xelkê kirin.**

Deqa daxuyaniyê:

**Daxuyaniya Komîsyona Teşkîlatê ya PDKÎ derheq meşên nerazîbûnê di Îranê de**

**Xelkê şoreşger û mafxwaz ên Kurdistanê!**

Herwekî ku hûn agehdar in di heyama çend rojên borî de, di beşek ji bajarên Îranê û Kurdistanê de, xelkê bêzarbûyî ên van navçeyan, wekî eşkerekirina nerazîbûna xwe li hemberî giranî û rewşa xirab ya aborî û gendeliya siyasî, îdarî û malî ya demûdezgehên rejîma Komara ÎSlamî û berpirsên wê, gellek cesûrane hatine ser şeqaman, û bi diruşmên mafxwazane ên xwe, tewawiyeta rejîma axûndî kirin armanc.

Meşvanan, ku hemû tex û çînek tê de ye, diruşma rûxana rejîmê hilgirtine, û di nava van diruşman de, xelkê nerazîbûna xwe derheq giranî, kêmdahatî û hejariyê eşkere kirine, û siyaseta destêwerdan û hederdana serwet û samana giştî ya welat, û alîkariya girûpên terorîstî ji aliyê rejîma Îranê ve mehkûm kirin.
Mixabin bi sedema serkuta bêrehmane ya hêzên serkutkar ên rejîmê, çend kesek hatin şehîdkirin, û bi dehan kesî jî birîndar bûne, û bi sedan kes jî hatine destbiserkirin.
Komîsyona Teşkîlatê ya PDKÎ di vê derheqê de daxwazê ji hemû tex û çînên xelkê şoreşger ên Kurdistana Îranê dike, ku dengê xwe bixin rex dengê nerazîbûna xelkê navçeyên din ên Îranê, û li egera berdewambûn yan egera rûdana hereketên nerazîbûnê yên bi vî rengî, piştgiriyê jê bikin.

Tevî daxwazên xwe bo piştevaniya ji hereket û meşên xelkê Îranê li dijî rejîma Îranê, em daxwaz jî dikin ku ew çend xalên jêr berçav bêne girtin.

Yekem: Bona vê ku naveroka daxwazî û rêreva meşên xelkê, nehê guherîn ber bi aliyekî din, ji her cure hereketên bêserûber xwe dûr bigrin, û di vê derheqê de hişyar bin, û talankirin û êrîşa hêzên rejîmê li ser îdare û demûdezgeh û cihên giştî eşkere bikin.
Duyem: Ji her cure tundûtîjiyekê ku hêcetê bide rejîmê bona serkutkirina meşvanan, û xelkê bi giştî, xwe dûr ragirin, helbet hekî berevajiyê vê yekê rû bide, û hûn bergiriyê ji xwe bikin, ew yek cuda ye.

Sêyem: Em daxwazê ji hêzên çekdar ên rejîma Îranê û bi taybetî çekdarên rejîmê li Kurdistanê dikin, ku beşdariyê di serkutkirina xelkê de nekin. Hevdem em bi bîr jî tînin ku hekî beşdariyê di serkuta xelkê de bikin, di pêşerojê de bixwe berpirsyar in.

**PDKÎ**
**Komîsyona Teşkîlat**

---

**»»» Doma Manşêtê**

Xelkê bêzarbûyî ji destê wê deshilatê di Kirmaşanê de diruşmên wekî “bijî Kurdistan”, “bijî Pêşmerge” û “Kurdistan yek war e, Kirmaşan rojhilat e”, li dijî siyasetên dijîmirovî yên rejîma Îslamî a Îranê, dirêjî bi meşên nerazîbûnê dan.

Li gora dawî raporên pêwendîdar, di van meşên nerazîbûnê de, ku zêdetir ji 80 bajarên Îranê bi xwe ve girt, zêdetir ji 25 kes hatin kuştin, û çend sed kes jî birîndar bûn, û zêdetir ji 1300 kesên din jî hatin destbiserkirin.

Her di yekem rojên destpêka nerazîbûnan de, PDKÎ û Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê di daxuyaniyeke hevbeş de, daxwaz ji civaka navdewletî kirin, ku piştgiriya xelkê Îranê bikin.
Di beşeke daxuyaniya hevbeş ya herdu aliyan de hatibû:
“Çavkaniya serekî ya van nerazîbûnan kirîza aborî û kêşeyên kelekebûyî ên aborî û siyasî di nava Îranê de ne, ku encama çendîn dehikan hikûmeta stemkarane û pirr ji kirîz a Komara Îslamî ye, ku weha kiriye ku li ber xirabiya rewşa aborî, û bêminetiya hikûmetê li hemberî rewşa jiyanderbazkirinê, û bedbextiyên xelkê desteng û hejar, û herwisa mezaxtina bi qasî milyardan ji samana vî welatî, di tevdanîkariyan, û kiryarên terorîstî ên rejîma Îranê li navçeya Rojhilata Navîn, xelkê Îranê bi hemû tex û çînên cur bi cur ve bêne ser kolanan, û daxwazên xwe û dijberiya xwe digel tewawiyeta rejîma Îslamiya hakim di Tehranê de nîşan bidin”.

Herwisa di beşeke din de hatibû ku: “Ew meş, herwisa îşareyek e bi tûreyî û kîna serhevde kelekebûyî ya bi salan ji deshilatdariya kêrnehatî, gendel, nedadperwer û dîktator ku tu mecalekê bo nîşandana nerazîbûnan bi awayekî medenî nade hevwelatiyan, û di hember de berpirs nine, û tu hesabekê bo îradeya wan nake. Rejîma Komara Îslamî wekî hemû demên din, li hemberî daxwazên rewa û kiryarên medenî ên xelkê de, tu bersivek nine, ji bilî serkut û tundûtîjî û her di van çend rojan de jî, bi sedan kesî destbiser kirine, û hêza zor ya pasdar û dijîgeliyan û bi çek û cebilxaneyên curbicur ve şandiye hemû ciyan û bajarên Îranê, û bi zora çekê dixwaze ku xelkê serkut û bêdeng bike”.

Herwisa Komîsyona Teşkîlatê ya PDKÎ jî derheq meşên nerazîbûnê ên Îranê daxuyaniyek belav kir, ku di beşeke vê daxuyaniyê de hatibû:

“Tevî daxwazên xwe bo piştevaniya ji hereket û meşên xelkê Îranê li dijî rejîma Îranê, em daxwaz jî dikin ku ew çend xalên jêr berçav bêne girtin:

Yekem: Bona vê ku naveroka daxwazî û rêreva meşên xelkê, nehê guherîn ber bi aliyekî din, ji her cure hereketên bêserûber xwe dûr bigrin, û di vê derheqê de hişyar bin, û talankirin û êrîşa hêzên rejîmê li ser îdare û demûdezgeh û cihên giştî eşkere bikin.

Duyem: Ji her cure tundûtîjiyekê ku hêcetê bide rejîmê bona serkutkirina meşvanan, û xelkê bi giştî, xwe dûr ragirin, helbet hekî berevajiyê vê yekê rû bide, û hûn bergiriyê ji xwe bikin, ew yek cuda ye.

Sêyem: Em daxwazê ji hêzên çekdar ên rejîma Îranê û bi taybetî çekdarên rejîmê li Kurdistanê dikin, ku beşdariyê di serkutkirina xelkê de nekin. Hevdem em bi bîr jî tînin ku hekî beşdariyê di serkuta xelkê de bikin, di pêşerojê de bixwe berpirsyar in”.


Di encama van meşên nerazîbûnê de, Elî Xamineyî paş çend rojan bêdengî li hemberî bûyeran de, derkete pêşberî kamêrayan û got: Eva ku rû dide, karê dijminan e ku dixwazin bi pere û çek û siyasetê kêşeyan me re çê bikin.

Hevdem Rûhanî jî bi haşakirina ji rastiyan got: Yên ku têne ser kolanan, ew xelk nînin. Ew gotina Rûhanî tê vê wateyê, ku meşvan ji cihekî din re hatibin Îranê, û xelkê wir nebin, yan jî ew tenê wan kesan xelk dihesibîne ku stûxwarê wî bin.
Bi giştî serbarê hemû zext û givaşan û gefên rejîmê û demûdezgehên wê ên serkutkar, xelkê bêzarbûyî amade nînin ji biryara xwe ku heman rûxandina rejîmê û bidestveanîna azadiyê ye, paşekêşê bikin, û berdewam dibin li ser meşên xwe li dijî vê rejîma gendel û kedxwar û serberedayî.

# Nerîna Lîderan



Trump: " Xelkê Îranê bila çavnihêrê piştgiriyeke mezin ji aliyê me ve bin".



Macron: "Metirsiya şer digel Îranê heye".



"Paul Ryan": "Girîng e ku em ji meşên aştîxwazane di Îranê de piştevaniyê bikin".



Hikmetyar: "Îran leyîza DAÎŞ`ê ji Îraq û sûriyê tîne Efxanistanê".

# Erdheja 8`ê Befranbarê, Tehran hejand



**Piştî serhildanên cemawerî ên xelkê li çendîn bajarên biçûk û mezin ên Îranê, li dijî rewşa sepandî bi ser wan de ji aliyê rejîmê ve, beşek ji berpirsan rabûne ser xwe û bêdengî şikandin.**

Meşên bilome ên xelkê li bajarên Kirmaşan, Qûçan, Xuremabad, Meşhed, Hemedan, Reşt, Qum û çendîn bajarên din ên Îranê, ku li dijî rejîmê û rewşa nebaş ya siyasî û aborî ya dasepayî pêk hat, dijkiryara cihê matmayînê ya beşek ji rayedarên rejîma Îranê li pey xwe anî.

Di yekem dijkiryaran de, axûnd Mowehidiyê Kirmanî, pêşnimêjê demkî ê Tehranê daxwaz ji berpirsyarên rejîma xwe kir, ku bona pêşîgirtina ji dirêjîkêşana nerazîbûnan, înternet û torên civakî bi tewahî bêne sansor û çavdêrîkirin!.

Navbirî gotiye: Em dibe wekî Çînê rêgir bin ji dana zanyariyên nû bi yektir di nava xelkê de, û kêmkirina azadiyan, û dibe em pêşiya vegeşîna bîrokeyên bijehr bigrin!.

Ji aliyekî din ve Muhsin Nesicê Hemedanî cîgirê Îtila`atî ê parêzgeha Tehranê, derheq domkêşana vê pêvajoyê, hişdarî da û ragehand: Her cure meşeke nerazîbûnê di Tehranê de neyasayî ye, û bi awayên herî tund wê bêne bersivdan.

Navbirî ew rabûna xelkê girê daye bi pîlaneke derveyî ve, û ragehandiye: Dijîşoreş (Zidê Inqilab) dixwazin ku xelkê organîze bikin, û wan li dijî deshilatê bi kar bînin.

Her di vê derheqê de, Îshaq Cehangîrî, cihgirê yekem ê serkomarê rejîmê jî, ku pêştir berdewam hewl dida, xwe wekî dilsoj û xemxorê xelkê hejar nîşan bide, tevî îşarekirina bi nerazîbûnan ragehandiye: Komeke destên veşartî van nerazîbûnan organize dike, ku cihê nîgeraniyê ne!.

Hwerisa gotiye: Hinek kes dixwazin ku xelkê ji sîstema deshilatdar dilsar bikin, hekî ew nerazîbûn berdewam bin, di pêşerojê de wê bibin tevgerên civakî, ku ew yek gellekî mertirsîdar e, û piştre em nikarin kontrol bikin.

Derheq van bûyerên ku ma bes kirin, Elî Muteherî cihgirê yekem ê serokê meclisê jî, tevî destnîşankirina gefan li ser Wilayeta Feqîh, ku bi bawera navbirî pêk tên ji, kêşe û gefên navxweyî, gendelî, û jevbelawiya fikrî, bi nîgeranî ve gotiye: Ti garantiyek tuneye ku deshilata me wekî xwe bimîne.

Bedela hewldana bo vedîtina rêçareya lojîkî jî ji bo kêşeyan, Spaha Pasdaran a terorîst, Ehmedînijad bi handana xelkê bona birêveberina nerizayetiyan tawanbar kiriye, û di daxuyaniyekê de hişdarî daye ku ew rêpêvîn, pîlana "Eniya dijîşoreş a navxwe û derve" li dijî Wilayeta Feqîh e, ku ji bilî Amerîka û Îsraîl û Birîtanyayê, çend welatên Erebî ên navçeyê û hinek destên navxweyî jî rol tê de hene.

Bi armanca aramkirina rewşa derûnî ya xelkê nerazî û wekî taktîkekê bona bidawîanîna nerazîbûnan, axûnd Elem El-huda di nimêja Înê ya Meşhedê de, tevî rexnekirina tund ji dewletê ragehand: Berpirsyarên me, dibe ku girîngiyeke taybetî bidin daxwazên xelkê, û berî vê ku neçar bin birêjin ser şeqaman, dibe kêşeyên wan çareser bikin.

Navbirî ku di axavtinên xwe de bi awayekî qise dikir, wekî vê ku wî û banda wî ya mafyayî tu roleke wan di kêşeyên Îranê de tunînin, rû li neraziyan gotiye: Ya ku hûn daxwaz dikin, rewa û cihê hurmetê ye, û dibe dewlet bersivder be.

Di dawiyê de jî, bi hewldana bo tirsandina xelkê, li egera sernixûnbûna rejîma wan, ragehandiye: Nabe em îzin bidin ku hikûmeta me birûxe, û bê serkutkirin!.

Di du rojên borî de, çendîn civînên nerazîbûnê li bajarên curbicur ên Îranê de rû dan, ku tê de xelkê bêzarbûyî tevî daxwazên rewa ên siyasî û aborî ên xwe, komeke diruşmên wekî "Girtiyên siyasî dibe bêne berdan", "Merg û neman bo dîktator", "yan mirin yan azadî", "Sebixweyî, Azadî, Komara Îranî" li dijî rejîmê didan, ku kerb û nerehetiya rayedarên rejîmê li pey xwe hebû, û li gora dawî raporên belavkirî, dehan kes heya niha hatine girtin, û çendîn kes jî birîndar in.

**A: Şemal Terxîbî**

# Tirkiyê heya niha jî birînên Robiskiyê derman nekirine



**34 hevwelatiyên Kurd ku piraniya wan temenekî biçûk hebûn, di şeveke sirr û sar ya zivistanê de, bi bombebarana hêza esmanî ya Tirkiyê hatin kuştin**

**Piştî derbazbûna şeş salan bi ser karesata Robiskiyê de, heya niha jî bikerên vê cinayetê nehatine nasandin û dadgehîkirin.**

Di 28.12.2011`an de, 34 hevwelatiyên Kurd ku piraniya wan temenekî biçûk hebûn, di şeveke sirr û sar ya zivistanê de, bi bombebarana hêza esmanî ya Tirkiyê hatin kuştin, û termên wan hatin hincî-hincîkirin, û piştî derbazbûna şeş salan bi ser vê bûyerê re, heya niha jî tu kes li ser vê dosiyeyê nehatiye cezakirin.

Niha jî parêzerên vê dosiyeyê nekarîne ku hikûmeta Tirkiyê razî bikin bi vekirîhêlana destên dadweran bo lêkolîna li ser vê bûyerê, jiber ku dadgehê arteşa vî welatî wekî tawanbar nedaye zanîn, û dosiye daxistiye. Lewra parêzerên wê dosiyeyê dibêjin: "Sîstema dadweriya Tirkiyê heya 20 salên din jî nikare dadperwer be".

Herçend dadgeha bilind ya YE jî, ji vê xemsarî û zulma hikûmeta Tirkiyê hatiye agehdarkirin, û malbatên qurbaniyên Roboskiyê bi piştgiriya gelê xwe û bi riyên medenî û aştîxwazane gellek zext xistine ser aliyên pêwendîdar, lê dîsan jî hikûmeta Tirkiyê naxwaze bi dadgehîkirina bikeran, dilê malbatên qurbaniyan hêsayî û aram bike.

Serbarê vê zulma hikûmeta Tirkiyê derheq malbatên qurbaniyan, hikûmeta Tirkiyê pêkanîna rêûresmên bîranînê jî qedexe kirine.

Ji aliyekî din ve Selahattin Demîrtaş jî, ji Girtîgeha Edirneyê ji bo merasima bîranînê peyamek şand.

Beşek ji Nameya Demirtaş wiha ye:

"Mixabin dîroka me ya nêz bi komkujî, qetlî`am, sirgûn, înfaz û êş û eleman re tije ye. Ji Komkujiya Ermeniyan, heta Dêrsim, Mereş, Çorûm û Sêwas, Roboskî, Sirûc û Enqerayê, em ji dil û can êşa wan hîs dikin....".

Demirtaş herweha di peyama xwe de got, "Ez niha di Girtîgeha Edirneyê de me. Ji ber ku li pişt gotinên xwe me, li vir im. Bi ehd û peyman ji bo ku kujerên Roboskiyê bêne darizandin, em dê dev ji canê xwe berdin, lê dev ji vê têkoşîna xwe bernadin. Em dê li hember 34 canên ku li çiyayên Roboskî can dane, tu carî jibîr nekin. Em dê bîranîna wan her tim zindî bihêlin."

Parlementerê HDP'ê yê Şirnexê Ferhat Encuyê ku di Komkujiya Roboskiyê de birayekî xwe û 9 xizmên xwe winda kirin, têkildarî salvegera komkujiyê nameyek ji girtîgehê ve bo raya giştî şand, û wiha got: "Ya ku dikeve ser milên me, ew e ku em li hemberî zaliman û xerabiyê serî netewînin, û hêvî û berxwedanê mezin bikin."

Bibîranîna vê karesatê û pêdagiriya li ser vekirin û şopandina vê dosiyeyê nîşan dide, ku zulm û zorî û neheqî û cinayeta ku derheq xelkê bêtawan û kolber ê Roboskiyê hatiye kirin, bi zext û givaş û gefxwarinan nahê jibîrkirin, û heta dadperwerî di vê derheqê de bi rê ve neçe, xortên netewеya Kurd rehet û bêdeng narûnên, û dilê malbatên qurbaniyan jî hêsayî nabe.

# Torên civakî yên "Telegram" û "Instgram"ê di Îranê de hatine qutkirin

**Rejîma Îranê ji tirsa berfirehtirbûna nerazîbûnên hemwelatiyan li dijî gendelî û nebaşbûna rewşa jiyanê, torên civakî bo mînak "Telegram" û "Instgram" ku hemwelatî ji riya telefonanê ji wan mifahê werdigirn, qut kirine.**




Li gora raporên belavbûyî, heyanî niha nehatiye zanîn ku kesên ku torên civakî bo mînka Telegramê bi kar tînin şiyane wan li ser kompiyoterên xwe jî bi kar bînin, yan ne.

Derheqê vê yekê de ku kîjan navenda rejîmê biryara ravestandina karê wan du torên civakî di Îranê de daye nehatiye zelalkirin.

Hêjayî basê ye ku, hemwelatî ji bo rêxisitn û diyarîkirina dema xwenîşanderan ji Telegram û Instgramê mifahê werdigirin.

Piştî xwenîşandanan di Îran û Kurdistana Rojhilat de, hêla înternêtê bi rengekî berçav hatiye lawazkirin.

## Birêveberê kanala Telegram a “Bane News” hate binçavkirin



**Birêveberê Kanala Telegramê a “Bane News” a bajarê Bane ji aliyê hêzên Îtila`ata wî bajarî ve, hate binçavkirin.**

Li gora nûçeya gihîştî Ajansa “Kurdpa”yê, roja Çarşemî 13`ê Befranbarê, “Şuca`i Husênzade” birêveberê Kanala Telegram a “Bane News” ji aliyê hêzên ewlekariyê ên wî bajarî ve hate binçavkirin.

Çavkaniyeke haydar di vê derheqê de, ji Ajansa “Kurdpa”yê re, ragehandiye ku: Binçavkirina “Şuca`i Husênzade” di encama dozvekirin li dijî wî, ji aliyê şaredariya wî bajarî ve bûye.
Li gora gotina vê çavkaniyê, “Şuca`i Husênzade” di Kanala “Bane News” de bas ji têkdana cihê kar û kasibiya hemwelatiyê Kurd yê bi navê “Pîrmirad” û reftara nemirovî a wezîfedarên şaredariyê, digel mîwefiroşan kiriye, û gotiye ku ew serederiya wezîfedarên şaredariyê li ser biryara şaredarê bajarê Bane bûye.
Wî çavkaniyê herwiha ev yeka jî eşkere kiriye ku heta niha jî navbirî di girtîgeha Îtila`atê de ye, û ji bo azadkirina wî, daxwaza barimteya (weaîqeya) 500 milyon Tûmenî jî kirine.

## Hêzên rejîma Îranê Pirtûkên olî yên Cihûyan ji nav dibin

**Hêzên serkutker yên rejîma Îslamî a Îranê, bi êrîşkirina bo ser Kinîseyên Cihûyên bajarê Şîrazê, dest bi wêrankirina avahiyên pîroz yên Cihûyan kirine, û bêhurmetî bi ola pîroz a wan kirine.**

“Corc Haruniyan” yek ji çalakvanê civaka Cihûyan di gotûbêjekî de ragehandiye ku: Hêzên rejîmê bi êrîşkirina bo ser Kinîsaiya Cihûyan a bi navê “Hadaş” a ku di devera kevna Cihûyên bajarê Şîrazê de ye, ev avahiyî wêran kirine, û pirtûka pîroza Tewratê ku pirtûka pîroz a Cihûyan e ji nav birine, û pirtûkên olî yên din jî xistine nava avdestan (wc) de, û bêhurmetiyeke mezin bi vê olê kirine.

“Corc Haruniyan” bi givaşxisitnên dijwar ên ewlekariyê bo ser Cihûyan di Îranê de îşare kiriye, û gotiye ku:
Hemwelatiyên Cihû di bajarê Şîrazê de, bi sebebên ewlekariyê amade nînin heta bi telefonê jî di pêwendiyan de bin, û heta berpirsên leşkerî îzin nedane wêne yan jî girte vîdeoyekî ji vê bûyerê bigirin.

Her di vê pêwendiyê de, federasiyonên Cihûyên Îranî-Amerîkî di daxuyaniyeke hevpar de, êrîşa bo ser Kinîseya Cihûyan di bajarê Şîrazê de û bêhormetîkirin bi pirtûkên pîroz yên olî şermezar kirine, û ji ber encama vê kiryara hêzên rejîmê, nîgeraniya xwe anîne ziman.

## Hêzên rejîmê teqe li kolberan kirin



**Hêzên serkutkar ên rejîma Îranê di doma êrîşa li ser xelkê Kurdistanê, teqe li kolberan kirin, û hejmarek ji kolberan birîndar kirin.**

Li gora nûçeya ku gihîştiye malpera “Kurdistanmedia”yê, roja Yekşmeiyê 10`ê Befranbara 1396`an, demjimêr 8`ê sibezû, li gundên Dizilî û Derekî ya ser bi Hewraman a Rojhilata Kurdistanê, hêzên rejîma Îranê teqe li kolberan kirin, û kolber neçar bûn herin nav gund de, û hêzên rejîmê jî êrîşî ser xelkê gund kirin, û çend kes birîndar kirin.

Nûçegihanê malpera Kurdistanmedia bas ji vê kiriye ku hêzeke zaf ya rejîmê rijiyane nava gund, û riya hatûçûna wî gundî daxistine.

Hevdem roja Yekşemiyê 10`ê Befranbarê, sê kolberên Kurd ên xelkê navçeya Soma û Biradost a ser bi Urmiyê, li ser sînorê di navbera Urmiye û Tirkiyê, bi teqeya hêzên leşkerî ên rejîmê hatin hingavtin.

# Dilşad Seîd doktoraya mûzîka kurdî werdigre



**Hunermend û mûzîkjenê navdar ê Kurd Dilşad Seîd, roja 20-11-2017ê, li Zanîngeha Mozart a Salzbûrga Nemsayê, ji ber vekolîna xwe ya bi navê "Lêkolînek li ser mûzîka kurmancî û zêdetir berçavgitina strana rîtmî" pileya pir baş wergirt, biryare piştî bidawîbûna sala xwendiyê ya 2017-2018ê, di meha Hezîrana 2018ê de, bi rêûresmekî taybet bawernameya xwe werbigre.**

Ev yekemîn car e vekolînekî bi vî awayî yê akademîk û gring li ser mûzîka kurdî-kurmancî li zanîngehekî ewropî tê pêşkeşkirin. Di vekoînê de taybetmendiyên mûzîka kurmancî hatine destinîşankirin. Dilşad Seîd di vekolîna xwe de behsa vê yekê dike:

1- Piraniya mûzîka kurmancî bi reng û û şêweyê xwe ve cihê ye ji mûzîka gelên Rojhilata Navîn û herêma Qafqasê. Herwiha xalên hevbeş ên mûzîka kurmancî û mûzîka zaraveyên din ên Kurdî jî kêm in.

2- Di nava mûzîka kurmancî de melodiyekî aloz û xerîb ê bi navê "curcîna" heye, ku li hinek navçeyên Iraqê tê bikaranîn û piştî pêdaçûnekî baş diyar bû, ku ev melodî li gorî van sedemên li jêr hatine behskirin, berbelav e:

A: Di nav kurmancan de ev melodî pir belav bûye û pir ji mêj ve tê bikaranîn. Lê li hinek navçeyên Iraqê di destpêka sedsala bîstem û heta naverastê vê sedsalê hatiye bikaranîn, paşî pir kêm hatiye bikaranîn.

B: Li navçeyên din ên Iraqê, di stranên folklorî de nehatiye bikaranîn lê tenê di stranên nû de hatiye bikaranîn. Lê di kurmancî de bir berbelav e û di stranên folklorî de hatiye bikaranîn.

**Nivîsîn: Necmî Salih**

## Jiyana Kurdên li Ewropayê bû fîlm

**Derhênana fîlmeke nû ya drama ya kurdî bi dawî bû.**

Navê fîlmê "Strana Şikestî" ye, û ji aliyê derhênerê Kurd ê ji Kobanî yê Rojavayê Kurdistanê, Can Papîr ve, li welatê Nemsayê hatiye berhemanîn.

Fîlma "Strana Şikestî", fîlmeke drama Kurdî ye. Derhêner Can Papîr e û ji çîrok û senaryoya hevbeş a Can Bapîr û Evro Berazî ye.
Tevî ku hê jî fîlm nehatiye weşandin lê derhêner Can bapîr naveroka wê ji Rûdawê re aşkere kir û got, ku pûxteya wê li ser evîna keçeke kurd a mûzîkjena gîtarê ya li gel xortekî qereçî ye. Çîrok li bajarê Viyenna ya Nemsayê derbas dibe û li wir hatiye amade kirin. Herweha film beşekî ji jiyana kurdên li Ewropa dide nasîn.Fîlma "Strana Şikestî" zorî û zehmetiyên jiyana Kurdên li Ewropa dide nîşandan lê di warê aborî de ev fîlm bi xwe jî di bin şert û mercên zemhet de hatiye amadekirin. Fîlma bi 40 xulekî bê sponser û bi derfetên taybet yên derhêner hatiye berhemanîn.Komek aktor û karmendên hunerî û teknîkê yên Kurdên ji her çar perçeyên Kurdistanê, ku piraniya wan ji Rojavayê Kurdistanê ne, di fîlmê de cîh digrin.
Hunermend Canyar Kobanî û Evîna Welat, aktorên dramayê yên Sûriyê, Daryos Darî û Can Bapîr û hin aktorên din, çend ji wan beşdaran in.
Derhênana fîlmê hê nû bidawî bûye. Di dema pêş de dê li welatên Nemsa û Almanya û hin welatên din ên Ewropa were nimayîş kirin. **Nivîsîn: Necmî Salih**

## Li Danîmarkê romana jineke Kurd bû yekem



**Romana bi navê "Mirîşo" bala xelkê Danîmarkayê kişand**

Romana jineke Kurd, bala xelkê Danîmarka û hin welatên Ewropayê kişand û bû romana ku li Danîmarkê herî zêde hatiye firotin.

Nivîskara Kurd Sara Umer ku li welatê Danîmarkê niştecih e, mehek berê, li ser Enfal, kîmyabaran û êş û janên Kurdan, romaneke bi navê "Mirîşo" nivîsandiye.

Sara Umer beşdarî bultena nûçeyan a Rûdawê bû û ragihand, ku ev yekem pirtûk e ku bi zimanê Danîmarkî nivîsandiye.

Umer aşkere kir, ku pirtûka wê ya bi navê "Mirîşo" 50 hezar hatiye firotin û li Danîmarkê weke "pirtûka ku herî zêde hatiye firotin" hate destnîşankirin.

Ji ber ku xelkê Danîmarkê giringî dan pirtûka wê, Sara Umer ji bo ku di merasîma sala nû de piştî şahjina Danîmarkê axavtinekê bike, ji aliyê rayedarên Danîmarkê ve hat hilbijartin. Hêjayî gotinê ye ku ev yekem car e jineke Misilman di merasîma salane de gotarekê pêşkêş bike.

**Nivîsîn: Îlyas Aslanhan**

# Zimanê Kurdî

**Qursên Kurdî, A. Karabax**

Qursên Kurdî, A. Karabax
5

Hevok : a. Em çawa hatin wisa çûn. b. Ew hatin nehatin dest pê kirin.
9. Ji yên bi awayê biwêjî çêdibin :
Ava yekî serberjor çûyîn, Avareş bi çav re hatin.
Hevok : a. Ava Memê serberjor diçe. b. Avareş bi çavekî kalê de hatiye.
Ç) Çêkirina hokeran :
Peyvên ku di binyatên xwe de, wateyên hokerî tenê diparêzin ne pir in. Lê
nav, rengdêr, lêker, daçek, hwd û yên ku ji van hatine dariştin û çêkirin gelek in. Bi gelemperî ev, di erkên xwe yên hevokî de dibin hoker.
Li vir bi taybetî, hin qertafên çêkirinê yên ku bo peyvên hokerî jî tên bikaranîn, em ê li ser van rawestin.
Mînak 523/1 : Parkît : -ane, -anî, -ka, -kî, -ê, -tir, hwd : Çend bikaranîn :
a. Parkît : -ane
Edîbane(edîb + ane) ☐ Mem edîbane dipeyive.
Torane(tor + ane) ☐ Birayê wî torane digeriya.
b. Parkît : -anî
Wekanî(wek + anî) ☐ Diya Rewşenê hirî wekanî radixist.
Zûkanî(zûka + anî) ☐ Dema ku ew ji kaniyê dihat, zûkanî dimeşiya.
c. Parkît : -ka
Hêdîka(hêdî + ka) ☐ Destê xwe hêdîka bilind kir.
Zûka(zû + ka) ☐ Dema ku ew ji kaniyê dihat, zûka dimeşiya.
ç. Parkît : -kî
Êvarkî(êvar + kî) ☐ Azad êvarkî hat cem wan.
Mêvankî(mêvan + kî) ☐ Ew li cem wan mêvankî rûnişt.
d. Parkît : -ê
Biharê(bihar + ê) ☐Em biharê diçin zozanê.
Rojekê(rojek + ê) ☐ Ew ê rojekê bê mala we.
e. Parkît : -tir
Zûtir(zû + tir) ☐ Hun ê sibehê zûtir biçin bajêr.
Pirtir(pir + tir) ☐ Îşev ciwan pirtir hatin şanogehê.
Mînak 523/2 : Pêşkît : î- : Çend bikaranîn :
Îşev(î + şev) ☐ Îşev em li otelê dimên.
Îro(î + roj) ☐ Îro xwendekar ketin bêhndanê.

## Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- Sed werzî, dused derzî, di kona derziya diya min ra helbezî.

- Gupalkê babê minê kone, heft gupalik di kona gupalkê babê min ra çune.

- Termê Nihê, babê Nihê, Nihle piştê, çiyê heft car bêjit, dê çit beheştê.

- Rûvî di bin riha rûlê ra lûrî.

- Tîrek reşa kujî sor, ker çi? Cil çi? Cihur.

- Şelê Sêvoy şeş gez in, şeş gez şelê Sêvoy ne.

33 . Min bi fer zanî gelek hevoka bi zaravê Soranî jî pêra belavkem ji ber giringiya mijarê.

- Qir û pir û kavir, li ser berê spiyê girê girovir, li binê gera barholê da.

- Heşt heşt hirç, ew her heşt her-çên pişt pirç.

- Sê ker sê cil sê cihor, ne ker ne cil ne cihor.

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

**Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin**

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (317)

## Diruşmên taybet bi meşên li Rojhilata Kurdistanê



**Partiyên Kurdistana Rojhilat derheq meşên medenî ên Îranê, û wê beşa ku pêwendiya wê bi Kurdistanê ve heye, hinek diruşm diyarî kirine.**

Piraniya hizbên Rojhilata Kurdistanê derheq meşên cemawerî ên Îranê, û wê beşa ku pêwendiya wê bi Kurdisatnê ve heye, li ser van diruşmên jêr li hev kirine:

Li dijî rejîma Tehran
Bijî xebata bajaran
………….......

Bijî hevxebatî
Bo nan û azadî
Bo kerameta Kurdî
………….......

Çil sal zulm û cinayet
Êdî bes e, bêrûmet!
………….......
Serhildana ev care
Rasana çiya û ba

Dengê şêraneye Kurdan
Hawar dike Kurdistan
………….......

Heya negîjin azadî
Ne nan heye, ne şadî
………….......

Herifîn herifîn
Bo Komara dev bixwîn
………….......

Kurdistan û Kurdistan
Kelha xebat û berxwedan

## “Desteya Berxwedana Medenî a Rojhilat” Kempeyna “Rabûna Zagrosê” ragehand




**Kempeyna “Rabûna Zagrosê” bi armanca yekxistina hêza Rojhilata kurdistanê li dijî rejîma dagîrker û dîktator a Îranê, û ji bo gihîştina bi armancên xwe, çend rêkar pêşniyar kirin.**

Ew rêkarên ku hatine pêşniyarkirin, di şeş xalan da bi vî awayî hatine rîzkirin:

1-Xelkê bajaran, di dema êvaran de derkevin derve, kom bibin û nanekê bigrin destên xwe, û bikin hêma û nîşana biyavê aborî û bijîwa jiyana rojane ya xwe, di bin sîbera deshilata gendel ya hikûmeta axûndî de.
2-Jin û mêr zengên mobaylên xwe bikin muzîkên şoreşgerî ên Kurdî, û her yek rojê bo 5 hevalên xwe tekzengekê lêde, bi nîşana amadebûna bo civînan.

3-Em daxwazê ji ciwanan dikin, daxwaziyên xelkê li desteyên curbicur de bi rengê şîn (şînê esmanî) li ser dîwaran binûsin.

4-Em daxwazê ji helbestavan û hunermendan dikin, ku bi berhemên edebî û hunerî, herwisa bi sirûdên taybetî bibin piştevanê xelkê bêzarbûyî, û piştgiriyê ji daxwazên wan bikin.
5-Em daxwazê ji ciwanên kurdistanê dikin, ku îdareyên emnî-leşkerî bi tawana serkutkirina xelkê, û îdareyên çand (ferheng)ên rejîmê bi tawana jînosayda ferhengî ya kurdistanê, û îdareyên aborî (îdareya malyat û bankan) bi tawana jînosayda aborî ya xelkê Kurdistanê, bi rengê şîn reng bikin.

6-Em daxwazê ji xelkê bêzarbûyî dikin, ku li cihên giştî û dîrokî newarên şîn (şînê esmanî) li dewra dar û peyker û ...hwd bialînin.